

**Hun bi xêr hatin
Welatê xwe yê nû,
Komara Federala Elmanya**

We biryara xwe daye ku bi tevî malbata xwe di pêşerojê de li Elmanya bijîn. Ev biryar, ji bo we, ji bo zarokên we, ji bo malbata we xwediyê wateyekê giring e.

Ji bo hun li vir xwe wek “xerîban” nebînin, bervajî rojek pêşde li Elmanyayê xwe baş hisbikin û entegre bibin, me vê broşure amade kiriye û em dixwazin di vir de hin agahiyên û şîretên giranbiha bidin.

Navnisanên cihê şîretan ku we li ser maf û wezîfeyên we dikarin agahdar bikin, di dawiya vê nivîsa agahiyê de hun dikarin bibînin.

Jiyana nû, şansên nû

Jiyanekê di welatekê nû de bi xwe re bê guman gellek zehmetî tîne, bi taybetî zimanekê din, întizama civakê û ya hiqûqî. Bi gorî ku hun ji kîjan welatê hatibin, dibe ku wek mînak hewayaya vir ji wer e xerib were an jî cûdatiya di navbera çandan de bala we bikişîne. Bihêlin bila ev cûdatiyan û ev tecrûbeyên nû jiyana we dewlemend bikin û deriyekê nû ji bo şansên nû vekin.

Ya pêwîst ew e kû, hun hewl bidin, ku Elmanyayê û zimanê Elmanî fêrbibin, xwe entegreyê vê civakê bikin, bi mirovan re bikevin têkîliyê, li ser maf û wezîfeyên xwe bizanibin û wan bi cîh bînin. Wê demê hun jî bibînin ku gelek kes li Elmanyayê bixwaze alikariya we bike.

**Pêşeroja xwe û serkeftina xwe
plan bikin**

Bi gorî ku planên di serê we de ji bo jiyana pêşeroja we ya li Elmanyayê îmkânên cûrbecûr hene.

- Hun dixwazin li malê bimînin û zarokên xwe perwerde bikin?
- Hun dixwazin li kêleka malbatê karekê jî bikin?
- Hun dixwazin bixwînin?
- Hun dixwazin zeneatekê fêrbibin?
- An jî hun dixwazin huner û qabiliyetên xwe yê taybetî derbixin holê?

Ji bo van hemî rewşan di bajarên we û di derodorên we de xizmet hene. Di van waran de alikariya rêxistinên dewletî û yê ne ji dewletê dikarin bi awayekê profesyonel xizmeta we bikin.

Tengasî û zehmetiyan

Tengasî, zehmetî û dubendi parçeyek ji jiyana me ye. Ji bo vî hin daireyên alikariyê hene, wek:

- Ger di ware zimanê Elmanî de pirsgirekên we hebin,
- Ger di dibistan, di fêrbûna meslegê de û perwerdekirina zarokan de pirsgirek derkevin,
- Ger di jiyana malbatî ya taybet de pirsgirek derkevin û bibin sedem ji bo tengasiyên di warê mafê runiştandina li Elmanya,

Di din daireyan de an xebatkarên ku zimanê we dizane hene an jî ji wer e tercumanekî dikare were dîtin.

Pirsgirek pîr caran serê mirov gelek deîşînin. Pêwîst ew e ku mirov pirsgirekan nas bike û ji wan re çareseriyê bibîne. Beriya ku pirsgirekê we mezin dibin, zû bikin û alikariya profesyonel di nêzîkê xwe de bistînin.

Agahiyên taybetî û şexsî kû hun di van daireyan alikariyê de didin, herwisa pirsgirekên we tê veşartin û bi gorî qanunan nikare bikeve destê kesekî xerîb.

Ji bo agahiyên zêdetir hun dikarin serî li van cihan bidin:

- **Agahiya ewil ji bo Entegrasyon**
IFAK e.V.
Gremmestr. 19, 44793 Bochum
Telefon: 0234/3258242; Fax: 0234/3258243
E-Mail: sozialdienst@ifak-bochum.de
<http://www.ifak-bochum.de>
- **Kursên Entegrasyonê**
Integrationskurse bei der IFAK e.V.
Engelsburger Str. 168, 44793 Bochum
Telefon: 0234/67221; Fax: 0234/683336
E-Mail: ifak@ifak-bochum.de
<http://www.ifak-bochum.de>
- **Aliariya malbatê di warê civak-perwerde**
Engelsburger Str. 168, 44793 Bochum
Telefon, Fax: 0234/67221
<http://www.ifak-bochum.de>
- **Alikariya ji bo mafê runiştandinê**
Medizinische Flüchtlingshilfe Bochum e.V.
Dr.-Ruer-Platz 2 44787 Bochum
Telefon: 0234/325 9272; Telefax: 0234/904 1381
E-Mail: sozialdienst@mfh-bochum.de
www.mfh-bochum.de
- **Hilfe Alikarî ji bo jin û keçan**
MIRA - Internationales Bildungs- und Beratungszentrum für Frauen und Mädchen e.V.
Westring 43, 44787 Bochum
Telefon, Fax: 0234/3259176
E-Mail: info@mira-ev.de
www.mira-ev.de

Maf û wezifeyên min, wek koçberê nû, li Elmanya

**Ez bersiva pirsên xwe dikarin li
ku bibînim?**

*Pelên agahiyê ji bo koçberên nû li
Bochum*

Insiyatifekî ji



*Medizinische Flüchtlingshilfe
Bochum e.V.*

Dr.-Ruer-Platz 2 44797 Bochum;
Telefon 0234-3259272; Telefax 0234-9041381;
www.mfh-bochum.de

kurdisch kurmanj

